Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1289 | 13-Tîrmeh-2025 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# Di tabloyên wî de ked û berxwedana jinan

Dilîn Ehmed/Qamişlo

**Wênesaz Enwer Mihemed yek ji wan kesên ku bi rêya tabloyên xwe ked û berxwedana jinan derdixe holê.**

Bê gûman her mirovek xwedî pîşe an jêhatiyekî teybete ku di rêya kar û xebata xwe bandorê li civakê dike. Mîna hunemendan ku bi helbest û gotinên stranên xwe çanda civaka xwe diparêzin. Lewra civak bi ziman, çand û hunra xwe tê naskirin. Hunermendê wênexêziyê jî di civakê de xwedî roleke pir girîng e. Çimkî dengbêj bi deng û awazên xwe wênexêz bi firce û pênûnsa xwe hest û êşa civakê tîne ziman.

Wênexêz Enwer Silêman Mihemed yê ji bajarokê Abra ya navçeya Tirpespiyê ya Herêma Cizîrê ku zêdetirî 15 salin di hunera wênexêziyê de kar dike ji rojnameya me re axivî û diyar kir ku piraniya wênexêziyên wî li ser jiyana jinan e.





**'Şoreşa Rojava hestên min yên hunerê pêş xist'**

Enwer Silêman Mihemed wiha axivî: "Ji zûve ez karê wênexêziyê dikim, lê piştî lidarxistina Şoreşa Rojava min bi awayekî berfirehtir û pêşketîtir dest bi wênexêziyê kir. Lewra min xwest ku ez hestên xwe di rêya wênexêziyê bînim ziman. Bi taybetî min girîngî da berxwedana, kar û xebata jinan û rola wê ya di civakê de çi yên di qada siyasî û leşkerî de be çi jî yên civakê. Ji ber ku jin di avakirina civakê de û pêşketina nifşên nû xwedî roleke pir girîng e. Ji bo wê ez di xebata xwe ya wênexêziyê girîngiyê didim jiyana jinan."

**'Lidarxistina festîvalên hunerî xwedî name û bandor e'**

Enwer Mihemed destnîşan kir ku ew her sal bi tabloyên xwe yên wênexêziyê tevlî gelek mîhrîcan û festîvala dibe. Li ser li darxistina mîhrîcanên wênexêziyê Enwer wiha got; "Şoreşa Rojava derfeteke zêrîn ji bo hunermendê wênexêziyê pêşkêşkir, lewra bandora wênexêziyê mîna çekan ne. Di lidarxistina mîhrîcan û festîvalên hunerî de bi dehan hunermend li hev dicivin û her yek ji wan bi fikir û nameyeke cuda tevlî dibe. Ev jî ji bo pêşxistina me tevan pir girîng e."

**'Armanca min xwedîderketina li keda dayîkê ye'**

Wênexêz Enwer Silêman Mihemed diyar kir ku armanca wî ji wênexêziyê ew e ku, name û hestên xwe ji tevayîya mirova re bîne ziman û li ser wênexêziya xwe ya dayîkê gotina xwe bidawî kir: "Bê gûman wênexêzî ji hezkirin û jêhatiyekî mirov tê kirin, çimkî ne her kes dikare di vê hunerê de bixebite. Armanca min jî jê ev bû ku ez têkoşîn û berxwedana jinan di rêya hunera xwe de bînim ziman. Yek jê ev wênexêza min ku min dayîka xwe yan jî dayîka me tevan ku tevlî temenê xwe yê mezin hê jî kar dike û ji bo xwedîkirina zarokên xwe li ber xwe dide. Lewra di jiyana mirovan de û di civakê bi giştî de, dayîk her tişte. Ji bo wê divê em jî li ked û berxwedana dayîkên xwe derkevin."

## Gotina Dawî



### Jinavbirina çekan ji bo aştiyê gavek e!

Mihemed Seydi

11'ê Tîrmehê ango roja jinavbirina çekan ji aliyê Tevgera Azadiya Kurdistanê ve di dîrokê de bû rojekî bi nîşan. Ev gav her çiqasî sembolîk be, lê eşkere dike ku Kurd çiqas bi rêxistin û xwedî gotin in. Peyam bû ji hemû cihanê re ku Kurd çiqasî li pêyî aştiyê ne û di heman demê de Cengawerên jîr û jêhatî ne. Çeka xwe ji nav dibin, lê teslîm nakin. Şer dikin lê ji bo aştiyê jî destê xwe dirêj dikin.
Di van çend mehên derbas bûyî de gelek nirxandin dihatin kirin û dihat gotin ku ew ê PKK çekên xwe teslîm bike û ew ê hinekan li Hewlêrê teslîm bikin û hinekan bidin dewleta Tirk û hwd. Ev gotegot jî bi armanca tevlîheviyê di nava raya giştî ya Kurdan de derbixin dihatin belav kirin. Carne jî li ser Ekranên Medyayê dihat belavkirin ku PKK'ê di nava xwe de ne yek nêrîne û wê bi ya Ocalan nekin û her beşek girêdayî nizanim kîjan dewletê ye û wiha bi rojan li ser diaxivîn. Bi vê jî dixwastin baweriya bi Tevgera Azadiyê di hundirê gelê Kurd de bugherin. Lê pêvajoya ku derket pêş her kesî, ji her kesî re diyar kir ka ev tevger çiqas bi baweriya xwe, bi serokê xwe ve jî girêdayî ye û çawa xwedî bingeheke qewîm e.
Li aliyê din, pêngava ku rêber Ocalan bi Aştî û Civaka Demokratîk bi nav kir, di hembêza xwe de de îtîfaqa di navber gelên herêmê de digre û şer û pevçûna ku bi salan e dirêj kiriye wê bi dawî bike. Piştî merasîma jinavbirina çekan a koma gerîla, serokê MHP'ê dewlet Bahçelî derket û got ku Ocalan soza xwe bi cih anî. Ev gotina wî jî diyar dike ku êdî bar ketiye ser milê dewletê û divê ew gavan bavêje. Dîsa ger wê gav werin avêtin, divê dewleta Tirk ji destpêkê de zimanê xwe yê çapemeniyê sererast bike û Kurdan bi terorê tewanbar neke. Ger vî zimanê xwe neguherin, wê demê divê Kurd jî vê yekê li hember wan bînin ziman. Ma bi hezaran Ciwanên Kurd ne ji ber terora dewletê berê xwe dan çiyan û ketin nava refên PKK'ê? Ma ne teror be çiye ku bi hezaran siyasetmedar û çalakvanên Kurd di zîndanên dewletê de ne. Ma ne terora dewletê bûya wê çima xelkê Cizîrê îro di nava kampa Mexmûrê de penaber biya na? Ger em qale terorê bikin, terora ku li hember gelê Kurd hatiye kirin di dunyayê de mînakên wê kêm in. Gotina dawî wiha ye; Kurdan ji bo aştiyê dîsa destê xwe dirêj kir û bar li ser milê dewletê ye.

## Sudoku:Pirs 48

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | 5 | | 3 | | | 4 | | |
| | 2 | | 6 | | | 9 | 3 | |
| | | | | 5 | 1 | | 2 | |
| | 4 | | 5 | | | | | 8 |
| 7 | | 9 | | | | 6 | | 1 |
| 6 | | | | | 7 | | 4 | |
| | 7 | | 1 | 2 | | | | |
| | 1 | 3 | | | 5 | | 9 | |
| | | 2 | | | 3 | | 6 | |

## Sudoku: Bersiv 47

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 2 | 1 | 8 | 9 | 4 | 3 | 6 | 7 | 5 |
| 7 | 9 | 6 | 8 | 5 | 1 | 4 | 3 | 2 |
| 4 | 5 | 3 | 6 | 7 | 2 | 1 | 8 | 9 |
| 5 | 8 | 7 | 1 | 2 | 6 | 3 | 9 | 4 |
| 9 | 2 | 1 | 5 | 3 | 4 | 8 | 6 | 7 |
| 6 | 3 | 4 | 7 | 9 | 8 | 5 | 2 | 1 |
| 8 | 6 | 2 | 4 | 1 | 9 | 7 | 5 | 3 |
| 3 | 4 | 5 | 2 | 6 | 7 | 9 | 1 | 8 |
| 1 | 7 | 9 | 3 | 8 | 5 | 2 | 4 | 6 |

## FERHENGA BIWÊJAN

**LI SER ÇIKÛZÎ Û TEMAYIYÊ**

**Bêdarî tiriyê xwe naxwin:**
- Mirovekî pir çikûz e; tima ye.
(Bêdarê navê gundekî ye)
**Bibe ewr baran jê nayê:**
- Bi heman wateyê.
**Bi çakûçan qurûş ji dest dernakevin:**
- Bi heman wateyê.
**Bi kelbetanan qurûş ji dest dernakevin:**
- Bi heman wateyê.
**Çavê mirov dernaxe:**
- Çavteng e; çikûz e; kinoj e; kund e.
**Çavteng e:**
- Bi heman wateyê.
**Çavê wî yê rastê roniyê nade yê çepê:**
- Bi heman wateyê.
**Çavê wî tijî ax be:**
- Pir tima ye; ji malê dinyayê têr nabe.
**Çavê wî li destê mêvanê wî ye:**
- Çavteng e; çikûz e; kinoj e.
Çavê wî li tasika di nav gavên wî de ye.
- Bi heman wateyê.
**Destê wî rast naçe paxila wî:**
- Ji bo kesê pir destgirtî tê gotin.
**Destê wî girtî ye/destgirtî ye:**
- Kinoj e; çikûz e; ne mirovekî merd e; tima ye.
**Deste wî tijî garis be, libek je narije:**
- Bi heman wateyê.
**Destmiç e:**
- Bi heman wateyê.
**Devê wî li malê wî venabe:**
- Pir tima ye; kinoj e; çikûz e.
**Devê xwe daye ber bayê geliyan:**
- Têr naxwe; pir tema ye.
**Dikire nafiroşe:**
- Bi heman wateyê.
**Dinya bişewite destek firîkê wî tê de naçe:**
- Pir tima ye; çikûz e.
**Dinya tev bişewita gurzek giyayê wî naşewite:**
- Bi heman wateyê.
**Dû ji mala wî dernakeve:**
- Pir tima ye; kinoj e.
**Em dixwin nanê sêlekê ew dixwe nanê êlekê:**
- Ji bo kesê temakar tê gotin.
**Êrtî bacanê xwe naxwin:**
- Bi heman wateyê.
(Êrtê navê gundekî ye)

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## 'Berxwedana 14'ê Tîrmehê ruhê têkoşîna azadiyê ye'



Endamê Meclisa Malbatê Şehîdan Siyamend Silêman anî ziman ku di 14'ê Tîrmeha 1982'an de ciwanên Apoyî ji bo gihiştina azadiyê, ketin rojiya mirinê, heta şehadetê jî berxwedan domandin û got, "Berxwedana 14'ê Tîrmehê ruhê têkoşîna azadiyê ye."**R-3**

## Dagirkeriyê cihên bihûşt veguherand dojeheke li ser rûyê erdê

Bi avabûna Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê re êrişên dagirkeriya Tirk û çeteyên wê li ser herêmê zêde bûn û gelek cih hatin dagirkirin. Cihên dagirkirî jî veguherîn mîna dojehekê.**R-5**





## 'Em tenê dixwazin vegerin cih û warên xwe'

Jinên Kampa Newroz bang li saziyên mafê mirovan kirin ku hesab ji dewleta Tirk were xwestin û gotin, "Jiyana li kampan zor e, em rastî gelek zehmetiyan tên, daxwaza me tenê ew e ku em vegerin malên xwe."**R-6**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1289 | 13-Tîrmeh-2025 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S

# BANGA RÊBER APO NEXŞERÊYA AŞTÎ Û CIVAKA DEMOKRATÎK E

Di çarçoveya banga dîrokî ya Aştî û Civaka demokratîk a 27'ê Sibata îsal de, piştî 26 salan Rêber Abdullah Ocalan cara yekemîn ji girtîgeha Îmraliyê bangeke bi dîmen kir û bala tevahî cîhanê kişand. Koordînasyona Kongra Star Rîhan Loqo diyar kir ku banga dîrokî ya Rêber Apo di 9'ê Tîrmehê de ya bi dîmen li tevahiya cîhanê deng veda û got "Pêwîst e dewleta Tirk gavên berbiçav bavêje, da ku pirsgirêka gelê Kurd û herêmê were çareserkirin."**R-2**






## Ji bo parastina çanda Kurdî... Festîvala Şehîd Ronahî ya Govendê

Festîvala Govendê ya Netewa Demokratî ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê bûye nimûneya zindî ya çand û nasnameya civakî. Îsal jî wê di 15'ê Îlonê de li Qamişlo bê lidarxistin.**R-7**




## Gelo rewşa Îranê ber bi ku ve dê biçe?

Profîsorê ji Rojhilatê Kurdistanê Sîvan Seîd anî ziman ku li Rojavayê Kurdistanê Hêzên Sûriya Demokratîk bûne hêzek parastinê ya sereke ji bo tevahiya Sûriyê û got, "Wê heman hêza QSD'ê li Rojhilatê Kurdistanê bê dîtin."**R-4**



**Peyama bi dîmen û deng a Rêber APO!**
Ahmet Aktaş R-4



**Rêber APO Rûyê Geşedanên Li Herêmê Diguherîne**
Idrîs Henan R-5

# ‘Banga dîrokî ya Rêber Apo li tevahiya cîhanê deng veda’

Koordînasyona Kongra Star Rîhan Loqo diyar kir banga dîrokî ya Rêber Apo ku di 9'ê Tîrmehê de bi dîmen kiribû li tevahiya cîhanê deng veda, û got “ Pêwîst e dewleta Tirk gavên berbiçav bavêje, da ku pirsgirêka gelê Kurd were çaresekirin û mafê hêviyê pêk were.”

**Dîlan Mulhim/Qamişlo**

Piştî berxwedan û tekoşîna Rêber Apo ya 27 salan cara yekemîn, bangeke dîrokî a bi dîmen da, herwiha vê bangê li tevahiya Rojhilata Navîn û cîhanê deng veda. Di heman demê de, Rêber Apo Tevgera Azadiyê ji bo Aşitî û Civaka Demokratîk erka ku dikeve li ser milên wan pêk anî. Lê heta niha dewleta Tirk tu gavên berbiçav ji aliyê xwe ve ne avêtiye.
Di derbarê banga Rêber Apo de koordînasyona Kongra Star Rîhan Loqo ji Rojnameya me re axivî.

**‘27 salin Rêber Apo têkoşîna parastina hebûn û nasnameyê dike’**

Rîhan Loqo di destpêka axaftina xwe de wiha got:“ Dema ku em behsa têkoşîna dîrokî dikin, em behsa hebûn û nasnameyê dikin. Di dirêjahiya dîrokê de bê navber gelê Kurd berxwedaneke mezin li hemberî hişmendiya nijadperest, olperest, zaynperset û netewperest ya ku hebûna gelan û jinan tune dike, dane meşandin. Herwiha nasnameya gelê azadîxwaz û sosyalîst di Rojhilata Navîn û cîhanê de tune dihesbandin, ev têkoşîn li hemberî van hişmendiyan û siyaseta tunekirnê û qirkirinê hate meşandin. Di heman demê de, ev 55 salin ku gelê Kurd bê navber bi pêşengtiya Rêber Apo berxwedanekî dîrokî didin meşandin. Rêber Apo, gelê Kurd di Rojhilata Navîn û cîhanê de ji qirkirnên



mezin parast û careka din hebûn û nasmeneya wan zindî kir. Lewma li hember vê têkoşînê û sekna bi rûmet dewletên navnetewî bi komployeke bêbext di sala 1999’an de li ser Rêber Apo dane meşandin. Ev 27 salan ku Rêber Apo di girava imraliyê de têkoşîna parastina nasname, aşîtî, jiyana bi rûmet û civake Demokratîk dike.”

**‘Piştî têkoşîna 27 salan care yekemîne ku dîmênê Rêber Apo tên parvekirin’**

Rîhan Loqo anî ziman ku Rêber Apo piştî têkoşîna 27 salan di 19’ê Tîrmehê de bangeke dîrokî a bi dîmen da û vê bangê li tevahiya cîhanê deng veda û got: “ Dema ku em behsa komploya navdeweletî ya li ser Rêber Apo dikin, em behsa têkoşîn û berxwedaniya li hemberî wê dikin. Herwiha ev 27 salin ku berxwedaneke dîrokî li hemberî tevahiya hişmediyên desthildar, siysete tunekirinê û pilanên ku dixwestin di sedsala 20 û 21 ê de pêk bînin, tê meşandin. Ev hişmendî, pilan û siyasete tunekirinê bi berxwedaniya 27 salan hatiye tunekirin. Rêber Apo piştî têkoşîna 27 salan di 19’ê Tîrmehê de bangeke dîrokî bi dîmen da û vê bangê li tevahiya cîhanê deng veda, ev jî kêfxweşiyeke mezin xiste dilê zarok, jin û malbatên ku li ser fikirê Rêber Apo mezin bûne. Bi derketina dîmenê Rêber Apo re gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê, tevahî bi pêkhateyên xwe derketin qadan ev yek bi kêfxweşî pîrozkirin.”

**‘Rêber Apo di sedsala 21’ê de bi zimanê polîtîk dest bi diyalogê kir’**

Rîhan Loqo axaftina xwe wiha berdewam kir: “ Rêber Apo li hemberî hişmendiya ku xwestin di sedsala 20 an de me tunebikin berxwedaneke dîrokî da meşandin. Herwiha niha di sedsala 21 ê de Rêber Apo bi polîtîkekî strajîtîk zimanê diyalog û siyasete demokratîk pêş xist. Ev jî hişt ku gelek guhertin û veguhertin di Rojhilata Navîn de çêbibin, gelê Kurd û gelê ku baweriya wan bi azadiyê û civaka demokaratîk tên. Pêwîst e di sedsala 21 de li gorî pirojeya netewa demokratîk maf û hebûna gelên azadîxwaz di Kurdistanê de were misogerkirin. Di heman demê de, çand û zimanê gelê azadîxwaz bi salên dem dirêj were misogerkirin. Rêber Apo di sedsala 21’ê de siyaseta demokratîk bi aweyekî hiqûqî û qanûnî û bi zimanekî polîtîk bi riya diyalogê destpêkir. Ev yek jî li Bakurê Kurdistanê di girava imraliyê de hate destpêkirin û bandoreke mezin li tevahiya Rojhilata Navîn û cîhanê kir. Ev yek bi sekna bi rûmet ya 51 salin ku bi pêşgtiya Rêber Apo berxwedan û têkoşîneke mezin hate meşandin. Îro ev têkoşîn gihiştiye zimanê diyalog, siyaseta demokratîk, hiqûqî û qanûnî ku mafên gelê azadîxwaz di destûrên welatan de were parastin.”

**’Pêwîst e em bi zimanê diyalogê civaka demokratîk avabikin’**

Rîhan Loqo wiha pê de çû: “ Ji bo ku siyaseta demokratîk û hiqûqî pêk were, helbet hevgirtinekî gelên azadîxwaz yên ku baweriya xwe bi paradîgmaya netewa demokratîk anîne hebûn û gelên li herêmê têkliyeke xuşik û biratî bi hever dijînin. Ji bo ku em karibin careke din bi aweyekî bawerî û hezkirin vê têkiliyê xurtbikin, pêwîst e em bi zimanê diyalogê civaka demokratîk avabikin. Lewma gelên li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi pir rengî jiyan dikin û xwe birêvedibin. Gelên li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi aweyekî aşîtî û demokratîk bi hevre jiyan dikin, sîstemeke nimûne û altarnatîf ji bo tevahî mafên gelên li herêmê hatiye avakirin. Ev yek bû mînak ji bo tevahiya Rojhilata Navîn û cîhanê û helbet ev jî encamên piratîgmaya netewa demokratîk û siyaseta demokratîk e. Ji bo na vê yekê pêwîst e tevahî gelên azadîxwaz bi hev re careke din li ser vê erdinîgariyê bi têkiliya xuşik û biratiya ku me bi salên dirêj bi heve re jiyan kiriye, bingeh bigirin. Di heman demê de, da ku hîn zêdetir aşîtiyê, demoksatiyê û wekheviyê bi xwe re bîne.”

**‘Pêwîst e dewleta Tirk gavên berbiçav bavêje’**

Koondîrasyona Kongra Star Rîhan Loqo axaftina xwe wiha bi dawî kir: “ Beriya niha gelek kampaniya li ser asta cîhanî ji bo Rêber Apo re azadî û pirsgirêka gelê Kurd re çareseriya siyasî re hatin destpêkirin. Herwiha gelek kampaniya li ser asta Kurdistanê û Rojhilata Navîn ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo hatin destpêkirin û niha jî kampaniya ku ez dixwazin bi Rêber Apo re hevdîtin bikim hatiye destpêkirin. ji bo vê yekê pêwîst e bi aweyekî serbest hevdîtin were kirin, bê ku alozî çêbibin û zehmetî derkevin. Divê kesên ku dixwazin bi Rêber Apo re hevdîtin bikin diyalog pêşbixin, da ku bi lez û bez hevdîtin bi Rêber Apo re werin çêkirin. Ji ber ku dem hatiye ku bi zimanê diyalogê pirsgirêka Rojhilata Navîn were çareserbikin û Rêber Apo fîzîkî azad bibe. Lewma jî divê ku dewleta Tirk ji aliyê xwe ve gavên berbiçav bavêje, da ku pirsgirêka gelê Kurd were çaresrkirin û mafê hêviyê pêk were. Pêwîst e her kes li gorî pêvajoya niha û bi taybet pêvejoya dîrokî ya ku Rêber Apo destpêkiriye bi xebite, da ku bi baweriyeke mezin û bi sekineke bi rûmet mafê wekheviyê bi hev re bidestbixin.”

# Têkoşîna Azadiya Jinên Rojava

**Viyan Egîd**

Jinên Rojavayê Kurdistanê, di nav dîroka têkoşînê de bûne rêberên pêşketina mafê jinan û azadiya civakî. Di destpêka şerê Sûriyê ku di sala 2011`an de dest pê kir, ne tenê rewşa siyasî ya herêmê guherand, lê ji bo mafê jinan guhertinên mezin bi xwe re anî. Jinên Rojavayê Kurdistanê xwe ji desthilatdariya rêjîma Baas rizgarkirin û parastina mafê xwe kirin, ji tevahiya jinan re bû qadek ku jin dikare mafê xwe biparêzin û dewa azadiya mafê xwe bike.
Di sala 2012`an de, jinên Rojava bi hev re hêza Yekîneyên Parastina Jinê (YPJ) avakirin. Ev hêz karîbû bibe hêza parastina azadiya herêmê û tevahî jinan, ji ber ku jin ne tenê xwedî mafê xwe bûn, lê belê parastina mafê tevahî civakê bû, hêza jinan bibû pêşeng di şerê azadiyê de. Bi hemû hêz û îradeya xwe li hemberî çeteyan û dagirkeran rawistiya û şer kir, tu tiştek nekarî bû çavê wê bişkîne. Ew kîn û nefreta hemû salên ku dixwestin jin bidin tune kirin, perovajî wê jin li hemberî wan derket û hîn zêdetir xwe ji tevahî cîhanê re ispat kir. Bêguman şerê Kobanê bû sembola şerê mafê jinan. Çeteyên DAIŞ ku bi hêza leşkerî û terorî rewşa mafê jinan tune dikir, kobanê ya ku di komkujiyên mezin re derbasbû, hêzên YPJ bi tekoşîn û şerê xwe jin û civakê ji komkujiyan rizgar kir û nîşan da ku jin dikare ne tenê bi kar û xebatên civakê re mijûl bibe, lê belê dikare bibe leşkerekî xurt û li hemberî zêhniyeta ku hewil dide jiyana jinan tarî bike, şer bike. xwedawendên wekî Arîn Mîrkan, Avesta Xabûr û Barîn Kobanê ku bûn nimûneyên ku çawa jin dikarin bi heza xwe mafê xwe biparêzin. Di bin hêza civakî û siyasî de jî, jin bûn pêşengên rêxistinên siyasî û dikaribûn ku mafên gelek jinan bi pejirînin. Li vir jin karîbû qadên xwe yên siyasî, aborî, leşkerî, civakî, çandî û hwd… bêguman li vir jî êdî ne tenê jin xwe dît, hişt ku civak carekdin xwe nûjen bike. Her wiha gelek jinên Rojnamevan jî karîbûn bibin deng û çavê civaka xwe. Êdî ew deng û qêrîna ku ti kes ne dibîhîst, îro bûye deng û qêrîna azadiya jinan. Bi nûçe û dîmenên xwe nîşan dan ku jin ne tenê di bin hêza siyasî û leşkerî de têkoşîn xwe dike, lê belê dikare bi hêza rojnamevantiyê mafê civaka xwe biparêze.
Lê belê, di bin vê rewşa nû de, jin heya roja îro tekoşîna ku bi destxistiye mafê xwe diparêze, ji ber ku heya roja îro gelek alî hena ku jin qebûl nakin û hewl didin ku jin vegerînin tarîtiyê ku jin nikarîbe bi temamî azadiya xwe bibîne. Lê jinên Rojava ku îro bi hêza leşkerî, siyasî, çandî û civakî de bûne pêşeng, ew tu carî serî natewînin û her wê ji bo mafê xwe şer bikin. Ev rewşa nû dikare bê nirxandin wek pêvajoya azadiya jinan. Jinên Rojava di vê pêvajoyê de, dikarin bi hev re azadiya mafê xwe biparêzin û bibin bersivekî xurt, ji ber hêzekî cewherî ya jinê pir xurt heya.



# Ji bo parastina çanda Kurdî...Festîvala Şehîd Ronahî ya Govendê

Festîvala Govendê ya Netewa Demokratî ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê bûye nimûneya zindî ya çand û nasnameya civakî. Îsal jî wê di 15'ê Îlonê de li Qamişlo bê lidarxistin.

**Jîn Hisên/Qamişlo**

Festîvala Guvendê ya şehîd Ronahî Bawer ji sala 2015’an de destpê kir, tê de çandên heyî li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi dîlan, muzîk û cil û bergên xwe nûnertiya netewa xwe li ser dika festîvalê nîşan didin. Ev festîval dibe rêyek ji bo naskirina çanda netewên ku li ser vê xakê dijîn, herwiha çanda herêmê biparêzin û çanda gelan bi rêya govendan vejînin.

**Destpêkirina Festîvala Guvendê**

Festîvala Guvendê di sala 2015’an de dest pê kir, heya festîvala 5’emîn her sal dihat lidarxistin. Lê belê piştre biryar ji konferansa TEV-ÇAND’ê hate derxistin ku êdî her du salan bê li dar xistin. Dema ev festîval hate destpêkirin tenê bi navê guvend bû, lê di festîvala 5’emîn biryar hate dayîn ku festîval bi navê Şehîd Ronahî Bawer bê kirin ji ber ku salvegera raghandina şehdeta wê ye, êdî bibe rojek ji bo bîranîna têkoşîna wê.

**Dîrokên festîvalê ji 1’emîn heta ya 6’emîn**

Festîvala 1’emîn ya Guvedê di sala 2015’an de li bajarê Rimêlan hate



lidarxistin
Festîvala 2’emîn ya Guvedê di sala 2016’an de li bajarê Rimêlan hate lidarxistin.
Festîvala 3’emîn ya Guvedê di sala 2017’an de li bajarê Rimêlan hate lidarxistin.
Festîvala 4’emîn ya Guvendê di sala 2019’an de, bi drûşmeya “Bi vegera li ser kokê em ê govendên xwe zindî bikin” li bajarê Rimêlanê yê kantona Qamişlo hate lidarxistin.
Festîval Govendê ya 5’emîn a Şehîd Ronahî Bawer di sala 2021’an de bi diruşma “Her govendek çîrokeke û her çîrokek dîrokek e” li hola Serdem a taxa Mişêrfê ya bjarê Hesekê hate lidarxistin.
Festîvala 6’emîn a Şehîd Ronahî Bawer a Govendê di sala 2023‘an bi drûşmeya “Azadiya Rêber Abdullah Ocalan azadiya gelan e” li ser dika Navenda Çand û Hunerê ya Aram Tîgran ya bajarokê Rimêlan hate li dar xistin.
Îsal jî wê festîvala 7’emîn a şehîd Ronahî Bawer a Guvendê di 15’ê Îlonê li Parka Azadî ya bajarê Qamişlo bê li dar xistin.
Derbarê amadekariyên festîvalê endamê komîteya amadekar a Festîvala Şehîd Ronahî Bawer Zana Huner agahî da rojnameya me.

**Hemû netew tevlî festîvalê dibin**

Zana Huner diyar kir ku festîval li ser asta herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê wê bê li dar xistin (Heleb, Kobanê, Reqa, Tebqa, Qamişlo û Hesekê) û wiha anî ziman: “Em hewil didin ku li gorî îmkanan ji herêmên Sûriyê yên hundirîn jî tevlîbûn ji bo festîvalê çêbibe. Di festîvalê de wê komê ji newetên din ên li ser vê xakê jiyan dikin jî tevlî bibin ne tenê gelê kurd weke netewên(ereb, ermen, suriyan û hwd..”

**Ji bo hilbijartina koman**

Ji bo hilbijartina komên dixwazin tevlî festîvalê bibin, Komîteya Şopandin û nirxandinê ji 4 endaman pêk tê, di 15’ê meha Tebaxê de wê li hemû herêma Bakur û Rohilatê Sûriyê bigere, wê koman bişopînin. Nirxandina wan bi komîteya amadekar re wê bêne nîqaş kirin, piştî nîqaşan têne hilbijartin da tevlî festîvalê bibin.




**Armanc**

Li gorî endamê komîteya amadekar a festîvalê Zana Huner armanca wan ji li dar xistina festîvalê ku karibin di riya çanda netewa demokratîk, berhemên gelan her yek bi reng û dengê xwe, bi çand û cil û bergên xwe, nûnertiya çanda xwe bike li ser dikê, hemû çanda bêne nas kirin, kevneşopiyên wan ji guvend û mûzîk û hwd.. bêne parastin û di riya guvendê de vejîn bikin.

**Mercên beşdariyê**

-Dema her govendê divê ne kêmtir be ji 10 deqeyan û ne zêdetir ji 15 deqeyan.
-Divê hejmara endamê her kemekê di navbera 12 û 24’an de be.
Di 15’ê Tebaxê 2025’an de, tîmên beşdar dê ji hêla komîteya nirxandinan ve werin nirxandin.
-Her kom divê govendnê xwe amade bikin û li ber komîteya pêşnirxandinê nîşan bide, da ku bibin beşdarên roja sereke ya festîvalê.
-Her kom divê li ser govendên xwe yên herêmî xebitîne, tabloyek folklorîk pêşkêş bike ku bi wateyeke çandî û civakî çîroka xwe bibêje.
-Divê her govend bi muzîkekê zelal, zêrek û bi awayekî profesnal were pêşkêş; dibe muzîkê were lêdan an jî bi dewolla zindî (bi dahol û zurnayê.

# Çend gotin li ser wêjeyê (3)

**Cîger Efrîn**

Wêje, yek ji erka wê şîretkirina mirovahiyê ye. Ji ber ku weke pirtûkek dibistanê ye, ji jiyanê re. Armanca xwe naskirina jiyanê û nirxên mirovahî dide çandin.” (Dostoyevskî) gava mirov li naveroka roman, çîrok û helbestên heta niha hatine nivîsandin bîne ber çavên xwe dibîne ku, mijarên hevpar in. Wekî hezkirin, evîn, dijminatî, awayên şabûn û girî, debara jiyanê, pirsgirêkên malbatî, têkoşîna bindestan li dijî serdestan, qirkirinên serdestan pêk anîne, şer û pêdiviya aştiyê, pirsgirêkên sînorên dewletan, bindestiya jinê, pirsgirêkên gundiyan-karkeran, bi kurtasî hemû pirsgirêkên ku di nava civakê de hene bi awayekî wêjeyî hatine hûnandin. Her çiqas li her herêmekê, civakekê hin cudahî di egerên bûyeran de hebin jî (ku divê hebin û hebûna cudahiyan di navbera herêm û civakan-gelan de tiştekî asayî ye û pêdiviyeke mirovî-civakî ye), lê hemû mirovên li ser rûyê erdê dikenin, digirîn, diêşin, şa dibin, xemgîn dibin, diqeherin, hez dikin, nefret dikin, dilîna tolhildanê dijîn, dizewicin, xew dikin-radibin, zarok çêdibin, diwelidin, dimirin, nexweş dibin, tî û birçî dibin, bi kurtasî hemû pêdiviyên mirovî-civakî têne jiyankirin û di vê yekê de tiştekî sosret jî tune ye. Lê em nikarin bêjin ku, sedema ken, girî, qeher, şahî, evîn û hezkirina hemû mirovan yek e. Di heman malbatê de hemû ferdên malbatê bi heman bûyeran ne dikenin û ne jî digirîn û hwd. Bi qasî mirovan egerên cuda yên bilindbûn û çelmisîna wan dilînan hene. Mirovek ji helbestekê pir bandor dibe, ji mirovekî/e din re heman helbest bê wate ye.
Mijarên ku wêjeya şoreşê bigirin nava xwe hemû pirsgirêkên ku di nava civakê de hene û li çareseriyeke şoreşgerî digerin e. Di bingehê de mijarên ku wêje hildide dest, mijarên jiyanê ne û ji bersiva ji pirsa; “jiyaneke çawa”, “çawa bijîm”, “çi û çawa bikim?”, “evîneke çawa”, “jiyaneke çawa?”, “jiyan çi ye?”, Mirin çi ye?” re dibe bersiv. Bi kurtasî hemû mijarên ku bi hebûn û awayê bûyîna mirov-civakê re têkildar in dibin dabeşa wêjeyê.
Bêguman di serî de pirsgirêkên axlaqî-polîtîk, pirsgirêkên debara jiyanê, pirsgirêkên xweparastinê, pirsgirêkên ekolojîk û pirsgirêka bindestiya jin û hişmendiya zilamsalarî hildide dest.
Kêmasî ne di mijarên ku wêjeyê girtine dest de ye. Pirsgirêk ew e ku, di bin bandora hişmendiya dewletê û pergala zilamsalarî de mayîna wan e. Ji lewra jî li gorî tê xwestin tam nebûn bersiv ji civakê re. Mînak di romanên ku hezkirin-evîn girtine dest de wekheviyeke jin û mêr tune ye. An jin wekî koleyeke modern hatiye pêşkêşkirin, an jî ew jin ji jinbûna xwe derketiye û bûye siya mêrê serdest. Her wiha evîn li ser bingeha têrkirina ajoyan tê raberkirin. Perspektîfa nivîskar olî be, jin di çerçoveya ku ji parsûya mêr çêbûye û jin zeviya mêr e ku, mêr çawa bixwaze dikare zeviya xwe bi kar bîne. Ji xwe heger perspektîfa nivîskar modernîteya kapîtalîst be, çawa jinê tazî dike û wê ber dide kolanan. Bi kurtasî; nivîskar di kîjan pencerê re li dinyayê, li civakê dinêre wisa jî wêjeya xwe pêş dixe.
Bê guman ji bo civakeke mîna ya Kurdistanê û şoreşa wê wêje xwedî girîngiyeke mezin e. Ji ber ku beriya şoreşê wêjeyeke nivîskî zêde pêş neketibû, ya heyî jî bi giranî wêjeyeke devkî û bi trajediyan, gazinc û giliyan dagirtî, tê de tovên jiyaneke nû çilmisî bûn, girîng e ku wêje bibe xwedî karekterekî şoreşgerî û xwedî hêzeke şoreşî be. Ji ber ku lasayîkirina wêjeya berê û hilgirtina mijaran bi awayê beriya şoreşê, qet nabe bersiv. Ji lewra jî girîng e ku wêjeya Kurdistanê xwedî karekterekî şoreşgerî be. Ango mecbûr e ku qalibên ku ji sedêsalan ve wekî çarenûsê hatine qebûlkirin bişikîne û rêya azadiyê bi awayekî vekirî raber bike.
Her wiha çawa Rêber Apo her tişt hema her tim ji nû ve şirove kir û li gorî sosyolojiya civaka nû li ser bingeha civakbûna ku mirov pê bûye mirov veçirand, divê wêjeya şoreşê jî hema hemû mijarên ku Rêber Apo di parêznameyan de veçirandine bi zimanê wêjeyê veçirîne. Çimkî wekî ku jî Çernîşevskî dibêje; “Miletek bê wêje, kor û nezan e. Bi qasî miletek xwedî wêje be, zana û rewşenbîr e, mirovan hîn û şa dike.”
Bi taybetî jî di vê pêvajoya avakirinê de rista wêjeya şoreşê qat bi qat zêde bûye. Di vê wateyê de rexneyeke Rêber Apo li ser berhemên hevalan ên xwendine heye; hûn timî bi awayê bîranînan û jiyana berê dinivîsin. Halbûkî divê siberojê, dema pêş zêdetir binivîsin.
“Eger (wêjevan)nikare gelek mijarên ku bi salan li ser sekinîme tesbît bike, nikare bibe wêjevanekî xurt. Eger ew bixwe kesekî bê rih be, berovajîker be, ew nikare gelekî bi şoreş û wêjeyê ve terbiye bike. Nikare vê hunera wêje û wêjevaniyê bi hêjayî pêk bîne. Wê teng nêzî pirsgirêkan bibe. Bila ew bi xwe jî pirsgirêkan bibîne û jê re bibe hêza çareseriyê! Ger bixwe jî pirsgirêkan rast nebîne, nikare bi xwe jî şîrove bike û piştre jî bêje; “Ez wêjevanek başim” ev xwe xapandine.

# ‘Em tenê dixwazin vegerin cih û warên xwe’

Jinên Kampa Newroz bang li saziyên mafê mirovan kirin ku hesab ji dewleta Tirk were xwestin û gotin, “Jiyana li kampan zor e, em rastî gelek zehmetiyan tên, daxwaza me tenê ew e ku em vegerin malên xwe."

**Birûc Resûl/Qamişlo**

Li kampa Newroz ya girêdayî navçeya Dêrikê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi hezaran koçberên Efrîn, Serêkaniyê û Grê Spî ku lê dijîn. Tevî zor û zehmetiyên li kampê heya niha li ser piyane û têkoşîna li hemberî zehmetiyan esas digirin. Jinên ku jiyana wan li kampan hîn zehmetir e bi hêviya ku rojek bizivirin ser axa xwe bi zehmetiyan re têdikoşin. Di vê çarçoveyê de koçbera bi navê Zihîba Mihemed Şerîf û Hedila Mustefa ji Rojnameya me re axivîn.

Koçbera bi navê Zihîba Mihemed Şerîf ku yek ji koçberên bajarê Serêkaniyê ne, her wiha ev nêzî 5 salin ku di kampa newroz de bi cih bûne, Zihîba behsa astengî û zehmetiyên xwe di kampa Newroz de kir û wiha got: “Piştî ku dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê êrişî Serêkaniyê kir, em bi darê zorê ji warê xwe hatin derxistin. Wê demê em neçar man ku li kampan li herêma Şehbayê bi cih bin,



Zihîba Mihemed Şerîf



Hedila Mustefa

bêguman ev ji bo me zehmet û zor bû. Gelek kes ji bajar ango gundê xwe koçber bûn, çûn mal ji xwe re kirê kirin. Ji ber ku derfetên wan hebûn, lê ji ber ku derfetên me nebûn em derbasî kambê bûn. Jiyana li kampan di sir, seqema demsala zivistanî û kerma havînê de pir zor û zehmete, lê ji ber ku em bi biryarin ku em vegerin ser axa xwe emê hemû zorî û zehmetiyan derbasbikin.

**‘Her gav û kêliyek di kampê de têkoşîneke’**

Zihîba Mihemed di berdewamiya axaftina xwe de wiha got: “Ev 8 salin ku em ji Efrînê koçberbûne û her sal em dibêjin sala werê wê baştir be, lê mixabin her sal rewşa kampê xerabtir dibe, pêdivî kêmtir dibin. Hîn şer, pevçûn û kiryarên dijmirovî di serî de li heremên dagirkirî û tevahiya sûriyê didomin. Jiyana di kampêde em fêrkirin ku bi hevre jiyaneke hevbeş jiyan bikin û pêdiviyên xwe bi hevre temam bikin. Jiyana di hindirê kampan de ji hemû milî ve zor û zehmete, lê em bi hevre van zehmetiyan derbas dikin û di nava têkoşîn û berxwedanê de ne. Di kampan de jiyankirin gelek cûdaye, mirov fêrî jiyana hevbeş û zehmetiyên jiyanê dibe û ji bona armancên mezin hemû tiştî tehemul dike û derbas dike.

Jiyana zarokan jî di hindirê kampêde milekî xwe yê taybet heye, ji ber ku yên herî bi jiyana koçberiyê û di kampan de bandor dibin û zehmetiyê dikşînin zarok û jinin. Tevî hemû zor û zehmetiyan me têkoşîn kir û em hîn jî têkoşîna xwe berdewam bikin heyanî ku em bi rengekî ewle vegerin ser xaka xwe ya pîroz Efrîn.

**‘Zarokên me ji mafê jiyana bi ewle bê par in’**

Di heman çarçoveyê de Hedila Mistefa diyar kir ku cîhan êşên koçberan bi awayekî hesan digre dest û wiha dewam kir: “Cîhan giringî nade hêviyên me yên jiyaneke bi ewle, ango rewşa heyî ji rêzê digirin dest. Em weke mirov ji mafê xwe yê herî bingehîn bê par mane. Hema her kes tên ji me dipirsin çi pêwîstîyê we heya, ma qey ji ber xwe nizanin pêwîstiyên me çine. Tên ji me re dibêjin hûn dixwazin vegerin malên xwe? Lê belê kes ji bo em bi awayekê bi ewle vegerin ser cih û warê xwe tu kar û xebatê nade meşandin û erkên xwe bi cih naynin. Zarokên me ji mafê jiyana bi ewle bê par in, kî qebûl dike ku zarokên xwe bi vî awayê mezin bike, ku heya niha hin zarokên me ji derveyî kampê tu cihên din nedîtine û zaroktiya xwe jî jiyan nekirine û ji gelek pêdiviyên jiyanê bê parin.

**Em dixwazin vegerin cih û warê xwe**

Hedila Mustefa di dawiya axaftina xwe de wiha got: “Daxwaza me ji hemû sazî û dezgehên mafê mirovan yên navnetewî ew e, ku hesab ji dewleta Tirk û çeteyên wê were xwestin û vegereke bi ewle ya koçberên Efrîn û hemû heremên dagirkirî pêk were. Em alîkariyên mirovî naxwazin, em tenê dixwazin vegerin cih û warên xwe. Tenê em vegerin ser axa xwe emê ji nûve wê ava û bikin buhişt. Hêviya me her tim heye ku em ê, nêzîk ne dûr vegerin ser xaka xwe.

# Paqijî bingeha jiyaneke tedurist e

**Diyala Nîdal\ Qamişlo**

**Paqijî yek ji wan hêmanên herî girîng û bingeha jiyanê ye ku ji bo mirovan pir pêwîst e. Herwiha di vê her kes parastina kolan, tax, gund û bajarê xwe bike. Da ku civak bigihêje asteke pêşketî û bi çanda paqijiyê re bijî.**

**Danasîna paqijiyê**

Paqijî çand û şêwazeke jiyanê ye ku em bi rêya komek kevneşopiyên saxlem ên ku em rojane pêktînin digirin, da ku tenduristiya xwe wekî takekesan û ewlehiya jîngeha li derdora misoger bikin.

Parastina paqijiya jîngeh û derdora me ji çend aliyan ve pêk tê. Ji perspektîfa mirovan e ku divê her ferdê vê civakê hewl bide ku jîngehek paqij û bê qirêjî ava bike. Hevkarî û dilsoziya kesan bi jîngeha xwe re, hewaya paqij, axa çandiniyê û ava vexwarinê tê bidestxistin. Divê her kes xwe ji bîr nekin û kesên derdora xwe bi qirêjiya bajêr û jîngehê sûcdar nekin, bi hev re, em dikarin jîngeha xwe biparêzin û bi erkên xwe yên li hember wê rabin û nepirsin ka kî berpirsiyar e. Eger her kes dora mala xwe paqij bike, wê her dever paqij bimîne. Paqijî xweşik e, lê çiqas mezin e gava ew di hişê me de be. Jiyana te bi qîmet e, wê qirêj neke û nexe xetereyê.

**Girîngiya paqijiyê**

Paqijî yek ji wan hêmanên herî girîng û bingeha jiyanê ye ku ji bo mirovan pir pêwîst e. Ew tê wateya parastina tenduristiya laş, giyan û jîngehê ji ax, mîkrob û nexweşiyan. Paqijî kesayetî, tevger û cihê mirov di civakê de nîşan dide. Her kes rêzê ji mirovê paqij re nîşan dide, cihê bawerî û rûmetê ye. Xwe rihet, bextewar û ji xwe bawer hîs dike.

**Parastina paqijiya jîngehê**

Jîngeh tişta herî girîng di jiyanê de ye û ji bo ku jîngeh paqij û bedew bimîne, divê mirov gelek gavên berbiçav, girîng û birêkûpêk bavêje da ku jîngeha xwe saxlem û paqij bihêle.

**Divê civak bi çanda paqijiyê bigihîje asteke pêşketî**

Divê her kes paqijiya kolan, tax, gund û bajarê xwe bike. Ji ber ku civak bigihêje asteke pêşketî û bi çanda paqijyê re jiyan bike. Herwiha karê herî girîng û pîroz karê paqijiyê ye. Paqijî gelek girîng e, rê li pêşiya belavbûna nexweşiyan digre û dihêle ku şaristaniya bajêr were parastin.



Weke tê zanîn ku çanda paqijê di nava civakê de kêm e, welatî çopê davêjin kolan û parastina jîngehê nakin. Lewma welatî gazinan ji şaredariyê dikin û dibêjin ku bi erkê xwe ranabe. Di heman demê de, îro ne şaredarî tenê bi erkê xwe ranabe, ji ber ku di heman demê de xizmet û paqjiya kolan, tax, gund û bajêr erka her kesî ye. Lewma belavkirina çanda paqijiyê di nav gel de, bedewiya welat e. Di heman demê de, ajokar gemara xwe bêyî ku girîngiyê bidin malan an jî şêniyan davêjin kolanan û kesên ku avahiyan lêdikin kolanan qirêj dihêlin. Ji bo ku welatê me paqij bibe, Pêwîst e her kes li hemberî paqijya welatê xwe berpirsyar be.

**Çop dibe sedema nexweşiyan**

Li ku derê çop hebe nexweşî heye, her kes dizane ku niha herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê di rewşeke hesas a tenduristî re derbas dibin. Vîrusa koronayê careke din di nava gel de belav bûye, dema paqijî hebe jiyan jî bi tendurist dibe. Îro paqijî wekî nan û av girîng e, parastina tenduristiya civakê tê wateya parastina tenduristiya her kesê û ev yek bi paqijiyê ve girêdayî ye. Dema mirov derbasî welatekî dibe, çand û şaristaniya wî gelî bi paqijbûna welat tê pênasekirin.

Paqijî jî girêdayî hişmendiya mirovan e, pêwîstî bi guhertina hişmendiyê heye. Dema her kes xwe berpirsyar bibîne mal û taxa xwe paqij bike dê bajar paqij bimîne. Paqijî exlaq û çanda civakê ye. Çawa ku welatî parastina paqijiya malên xwe dikin, divê di heman demê de parastina kolanên bajarê xwe jî bikin. Lewra çareseriya paqijiyê di hevkariya gel de ye. Şaredarî çiqas paqijiyê bike jî, eger gel ne alîkar be û çanda paqijiyê di nava civakê de nebe, paqij nabe û wê diyardeya avêtina çopê dewam bike.

**Paqijî pêşketina welatiyan nîşan dide**

Gelên paqij ew gelên ku rêzdarî ji xwe û gelê xwe re digrin, dixwaze wêneyek xweşik ji yên din re nîşan bide, ji ber ku paqijî cûreyek ji exlaqê ye. Di heman demê de, parastina paqijiya bejahiyê erkeke divê her kes beşdar bibe, ji ber ku gelek mirov tê de jiyan dikin, herwiha paqijî mîna neynikekê pêşketina welat nîşan dide. Her çiqas ku gel parastina paqijiya bajarê xwe bike, wê ew bajar an welat pêş bikeve.

Divê mirov derdora mala xwe û taxa xwe biparêze û paqij bike, çopê navêje nava kolanan û bixe cihên taybet yên ji bona çopê hatine bi cih kirin û bi şaredariyê re di vî warî de alîkariyê bike û hevdû temam bikin û bi dilsozî kar û xebata xwe pêkbînin.



# ‘Berxwedana 14’ê Tîrmehê ruhê têkoşîna azadiyê ye’

Endamê Meclisa Malbatê Şehîdan Siyamend Silêman anî ziman ku di 14'ê Tîrmeha 1982'an de ciwanên Apoyî ji bo gihiştina azadiyê, ketin rojiya mirinê, heta şehadetê jî berxwedan domandin û got, “Berxwedana 14'ê Tîrmehê ruhê têkoşîna azadiyê ye."

**Hêvî Keleş/ Qamişlo**

Di 14’yê Tîrmeha 1982’yê de ciwanên Apoyî yên Kurd, Laz û Tirk li dijî faşîzma dewleta Tirk û derbeya leşkerî ya hovane ya 12’yê Îlonê di Zîndana Amedê de bi canê xwe felsefeya ‘berxwedan jiyane’ nivîsîn. Li zindana Amedê Rojiya Mirinê dan dest pê kirin. Tê de Kemal Pîr, Mehmet Xeyrî Durmuş, Elî Çîçek û Akiv Yelmazşehîd bûn.

Derbarê berxwedana 14’ê Tîrmehê de û bandora wê li ser şoreşê endamê Meclisa Malbatê Şehîdan Siyamend Silêman ji Rojnameya me re axivî.

**‘Berxwedaniya 14’ê Tîrmehê bû bingeha Şoreşa Rojava’**

Endamê Meclisa Malbatê Şehîdan Siyamend Silêman diyar kir ku li Zindana Amedê felsefeya berxwedanê hat afirandin û wiha got: “Roja 14’ê Tîrmehê gaveke mezin bû ji bo tevgera azadiyê û ev roj weke roja berxwedanê li cem gelê kurd tê binavkirin, di 14’ Tîrmehê de ciwanên Apoyî di salona dadgehê de ji bo ku bighêjin azadiyê û li dijî îşkence û ferzkirinên zilm û zordariya li nav zîndanê biryara çalakiya rûmetê dan. Ev roj, rojekî dîrokî ye û di dîroka Kurdistanê de gaveke girîng bû ji bo şoreşa azadiyê. Dijminên gelê kurd dixwestin ku dawiyê li kurdan bînin û wan tune bikin, lê bi riya vê roja berxwedanê û bi cesaret û îradeya ciwanên Apoyî yê ku canê xwe feda kirin ji bo ku li dijî derbeyên dewleta Tirîk yên hovane derkevin û ji ber wan qet qebûl nekdikirin ku nasnameya xwe ya kurdetiyê winda bikin. Berxwedana 14’ê Tîrmehê bandoreke bê hempa li ser gelê kurd kir ku berxwedaniya 14’ê Tîrmehê îro ji Şoreşa Rojava ango 19’ê Tîrmehê re bû bingeh û piştî vê rojê wan xeta şehîdan berdewam kir û îradeya wan xurtir bû.”



**‘Îro jî bi ruhê 14’ê Tîrmehê di çeperên şer de berxwedan tê meşandin’**

Siyamend Silêman destnîşan kir ku vîna 14’ê Tîrmehê perdeya faşîzma Tirk perçe kir û wiha got: “Berxwedana 14’ê Tîrmehê rojeke dîrokî bû ku lehengên kurd di vê rojê de de faşîzma dewleta Tirk parçe kir û heta dawiyê li ber xwe dan. Faşîzm mirovayetiyê nas nake, lewma li cihê ku mirovayetî nayê naskirin û li dijî mirovahiyê şer tê kirin, tenê çareyek heye, ew jî berxwedan e. Ew berxwedan ji sala 1982’an û heta îro tê, çavkaniya xwe ji van lehengan digire. Di roja me ya îro de di çeperên şer de ruhê 14 Tîrmehê heye. Careke din dagirkerî di zindanê de dixwaze îradeya Kurdiyetiyê bişkîne û teslîm bigire. Lê Ji ber ku ev îrade çavkaniya xwe ji van lehengan digire, ev îrade nayê şikandin.”



**‘Ji bo azadiya gelan heta serkeftinê em ê têbikoşin’**

Endamê Meclisa Malbatê Şehîdan Siyamend Silêman axftina xwe Wiha qedand: “Niha afirînerê vê berxwedanê, di şert û mercên ku ji zindana Amedê xirabtir e di zindana Îmraliyê de ye. Rêber Apo li ber xwe dide, em jî dikarin li ber xwe bidin. Divê em li berdevkê Şehîdan xwedî derkevin û Rêber APO ji wê dojeha Îmralîyê derxîn in. Em weke gel û mirovahî deyndarên wan şehîdên mezin in. Li ser vî esasî em ê têkoşîna xwe bidomînin û ji bo azadiya gelan heta serkeftinê em ê têbikoşin.”

# Roja şemiyê roja komînê ye

**Ronahî Sadûn/Qamişlo**

**Hevserokê Encûmena Cîbcîkar li Kantona Cizîrê Hesen Şero diyar kir ku ji bo pêkanîna Hevpeymana Civakî û xurtkirina sîstema Rêveberiya Xweser li seranserî herêmê, roja şemiyê ji bo karmendên Rêveberiya Xweser bû roja komînan, armanca vê yekê jî ew e ku gel bi îradeya xwe bibe xwedî hêza çareseriyê.**

Meclisa Gelan a Demokratîk a Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê li avahiya Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Reqayê di rûniştina xwe ya 114’an ya di 28’ê Pûşberê de erkên meclisên xwecihî û komînan nîqaş kirin. Di rûniştinê de erkên geşkirina meclisên xwecihî û xurtkirina wan di dayîna biryarên aktîv de ku di beşdarkirina rewşên xizmetguzarî û rêxistinî li herêman de bibin alîkar, hatin nîqaşkirin. Li kêlek wê xurtkirina rola meclisan di pêşkêşkirina xizmetguzariyên bingehîn de, weke peydakirina hîmeke datayan ji bo her komînekê û xebata berdewam ji bo wê yekê, birêxistinkirina xebata komînan, hevsengiya di navbera hêzên siyasî û leşkerî de, hatin gotûbêjkirin.

**Rûniştin bi erêkirina li ser derxistina giştînameyekê bi dawî bû û giştîname wiha bû:**

Avakirina komînan li gorî Hevpeymana Civakî û qanûna erkan. Roja şemiyê ji her hefteyê ji komînê re hat veqetandin, tê de endamên komînê, karkerên Rêveberiya Xweser amade bibin ku di pêkanîna xebat û planên komînê destnîşankirine de amade bibin. Di 3 saetên dawîn ên roja dewamê ya pêncşemê de bibe roja paqijiya sazî, meclis, cihên giştî û rêveberiyan. Ev sazî wê ji hêla karkerên li tevahî kantonan ve werin paqijkirin. Herwiha komîn li gorî qanûna birêxistinkirina erkên meclis û saziyên Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a bi hejmara /13 a 2023’an, bixebite. Di rûniştinê de hatiye gotin ku divê xebatên komîn û meclisan ji nû ve werin nirxandin û ji bo sîstema civakî baş pêk were xebateke berfirehtir bê meşandin.

Derbarê aktîvkirin û geşkirina rola komîn û meclisan li Bakur û Rojhilatê Sûriyê, hevserokê Encûmena Cîbcîkar li Kantona Cizîrê Hesen Şero ji Rojnameya me re axivî.

Hesen Şero diyar kir ku Rêveberiya Xweser ji bo xurtkirin û cîbcîkirina Hevpeyama Civakî gelek civîn li dar xistin û wiha got: “Rêveberiya Xweser ji bo xurtkirin û cîbcîkirina Hevpeyama Civakî, hem jî ji bo xurtkirina sîstema Rêveberiya Xweser li seranserî Bakur û Rojhilatê Sûriyê, gelek nîqaş û civîn kirin û lidarxistin. Di encama wan nîqaş û civînan de xaleke sereke ya Hevpeymana Civakî bû ku roja şemiyê bibe roja Komînê, li ser vê bingehê ji aliyê Rêveberiya Xweser li Kantona Cizîrê biryar hate cîbcîkirin. Armanca me ya sereke jî ji bo avakirina civakeke exlaqî-polîtîk û demokratîk e. Herwiha komîn jî bingeha vê sîstema Rêveberiya Xweser re. Ji bo wêna biryar hate derxistin ku roja şemiyê ne roja betlanê be, lê di wê rojê de hemû karmend ên di sazî û destgehên Rêveberiya Xweser de kar dikin, bi awayekî fermî kar û xebatên xwe li komînan xwe bidomîne. Ev jî dikeve werê xurtkirina sîstema komînê ku tê de îradeya civakê derkeve pêş. Civak jî êdî di rêya komîn û meclisên xwe de di sîstema Rêveberiya Xweser de cih bigre. Da ku civakeke xwedî îrade û bêhêz di vê sîstemê de cihê xwe bigre.”

**‘Bi aktîvkirina komîn û meclisan wê pirsgirêkên civakî werin çareserkirin’**

Hesen Şero eşeker kir ku ji bo aktîvkirina komînan, perwerde û civîn têne lidarxistin û wiha domand: “Niha ji bo aktîvkirina komîn û meclisan ji karmendên Rêveberiya Xweser re perwerde û civîn têne lidarxistin. Ji xwe dema em dibêjin roja komên ne tê wateya ku ev karmendên Rêveberiya Xweser herin komînê û li komînê bimînin çend seat û vegerin, em ê bi vê yekê negihên wê armanca ku em dixwazin. Lê armanca me ya sereke ku ruhek derbasî komînê bibe. Da ku ew komîn îradeya civaka di wê taxê yan di rêya wê meclisê re, derxîne holê. Di heman demê de civakeke bi îrade û rêxistinkirî ku karbin ji pirsgirêkên civakî yên ku rû didin, bibe bersiv, ava bikin. Ji bo wê jî ji bo ev sîstem bi awayekî demokratîk cihê xwe bigire, em li ser biryara xwe bi israrin ku hemû karmend di



roja komînê de bi awayekî çalak cihê xwe bigirin. Da ku guhertinek bikeve xebatên komînan de.”

**‘Gel bi îradeya xwe bibe xwedî hêza çareseriyê’**

Hesen Şero da zanîn ku dema komîn aktîv bibin wê îradeya xwebirêvebirinê ya gel derkeve pêş û wiha got: “Komîn û meclis di sîstema heyî de hebû, hem jî hevserok û komîteyên wê hebûn. Lê xwebatên wê piranî bi mijarên xizmetguzarî ve dihat mijolkirin, mîna bi na û xaz tenê ve mijûl dibûn. Ji bo wê pisgirêkên civakê yên ku rû didan, bi hêviya saziyên girêdayî Rêveberiya Xweser wek deste û ofîsên girêdayî encûmena cîbcîkar ku di wir de ew mijar bi wan ve dihate hiştin. Lê niha em dixwazin îradeya komînê bi van pirsgirêkên civakî re ku gel bi îradeya xwe bibe xwedî hêza çareseriyê, hem gel bi îradeya xwe taxên xwe birêve bibin û ji taxê herin meclisê bajarokan û bajarên giştî. Ya din dema em dibêjin pirsgirêkên civakî ne tenê ew nakokiyên di navbera du malbata de, yan di wê taxê de hinek pirsgirêkên mîna pirsgirêka paqijiyê, avê û elektirîkê hebin û bi îradeya komînê werin çareserkirin. Lê gava sîstema komînên komînal werin avakirin. Wê civak karibe li beramberî gelek siyasetên dijber ku dixwazin siyaseta demokratîk a li Bakur û Rojhilatê Sûriyê pêş ketiye, jiyana komînal a ku em dixwazin li pêş bixin, têk bibe, bibe bersiv.

Ji ber niha şerekî taybet li ser serê civaka me tê meşandin ku dixwazin civaka me ji hevdû bixe û nakokiyan derbasî nava civakê bikin, mînaka wê jî madeyên hişbir ê ku dixwazin derbasî nava civakê bikin. Lê civak bi rêya wê komînê bi jiyaneke komînal ku hemû bi hev re werin xwe perwerde bikin û wê demê em ê karibin li bermaberî vî şerî bibin bersiv.”

**‘Têvî kêm û kurtiya Bakur û Rojhilatê Sûriyê mînaka cîhanî ye’**

Hesen Şero axaftina xwe wiha qedand: “Tevî kurt û kêmasiyên ku di komîn û meclisan de di dema dawiyê de derketine. Lê dîsa jî sîstema komînê hebû, komîteyên wan hebû, em a kar û xebat ne di asta ku dihate xwestin, dihate meşandin. Ji ber herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê herêmek ku rûbirûyî êrişên pir mezin hate hiştin, şerekî pir dijwar lê rû da ku yek deqe yek sal jî beyî êriş li ser vê herêmê derbas nebû, tevî wê jî di rewşên awerte de komîn û sîstema heyî hate avakirin. Hem jî tevî ewqas zor û zehmetiyan ku di ernîgariyeke weke Sûrî de pêk hatine, lê Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê bû mînak ji bo Sûrî û giştî Rojhilata Navîn.”

# Gelo rewşa Îranê ber bi ku ve dê biçe?

**Profîsorê ji Rojhilatê Kurdistanê Sîvan Seîd anî ziman ku li Rojavayê Kurdistanê Hêzên Sûriya Demokratîk bûne hêzek parastinê ya sereke ji bo tevahiya Sûriyê û got, "Wê heman hêza QSD'ê li Rojhilatê Kurdistanê bê dîtin."**

**Lîloz Hisên/Qamişlo**

Di 13'ê Pûşperê de şerekî dijwar di navbera Îsraîl û Îranê de derket û 12 rojan dewam kir. Di encamê de herdu aliyan ziyanên mezin dîtin. Debarê nirxandina rewşa Îran û Rojhilatê Kurdistanê Profîsorê Alîkar ê Lêkolînên Rojhilata Navîn li Rohilatê Kurdistanê Sîvan Seîd ji rojnameya me re axivî.

**'Îhtîmalek mezin e ku şoreşek di hundirê Îranê de lidarkeve'**

Sîvan Seîd di destpêkê de bal kişand li ser rewşa Îranê û wiha anî ziman: " Berî şerê Îran-Îsraîlê dest pê bike, rewatiya dewletê tune bû, ev yek me dît dema hibijartina ku tenê ji sedî 10 ji gel beşdarî hilbijartinên berê bûn. Herwiha di warê aborî de hatiye hilwişandin, welatî bi zor û zehmetî jiyanê diqedîne. Rêjîma Îranê şerê xwe yê bi welatên din re wekî hincet bi kar aniye da ku rê li ber gel bigire ku mafên xwe bixwazin. Li her welatekî şer kir da ku rê li ber şerekî navxweyî di welatê xwe de bigire. Rêjîma Îranê ev 45 sal in bi vî rengî tevdigere. Ji xwe piştî şerê 7'ê Cotmehê, rêjîma Îranê piştgirên xwe winda kir, wek Hizbullah û Hamas. Piştî şerê Îran-Îsraîlê û hedefgirtina pisporên wê yên di çêkirina otomî de dixebitîn, ew qels bû."

Sivan Seîd îşaret kir ku piştî rawestandina şer du îhtimal hene: Ya yekem, şer dê ji nû ve dest pê bike, an jî îhtîmalek pir mezin heye ku şoreşek li hundir Îran derkeve û wiha got: "Du xalên girîng hene: Ya yekemîn Emerîka û Îsraîl pirsgirêka wan di warê mafên mirovan û demokrasiyê de li Îranê an li her deverek din de tune ye. Me heman tişt li Iraq û Afganistanê jî dît. Piştî bîst salan Talîban hate ser hukim tevî hebûna NATO'yê li wir. Ji bo hilweşandina dewletê ti pirsgirêkek wan tunebû, lê pirsgirêk nebûna çekên netomî û nebûna gefê li ser Îsraîlê bû. Niha wan serkeftinên xwe bi dest xistine. Ya duyemîn, di hundir de muxalefetek pir bihêz tune ye, lê li Kurdistanê heta radeyekê rêxistinkirî ye."

**'Şoreşa Jin, Jiyan, Azadî berdewam e'**

Sîvan Seîd diyar kir ku di pêşî de herî girîng e ku bizanin ku şoreşa Jin, Jiyan, Azadî ku li Kurdistanê bi şehadeta Jîna Emînî dest pê kir hîn berdewam dike û wiha dewma kir: "Lêbelê, şoreş rêyek cûda girtiye û li navenda Îranê û herêmên din pêşketinên cûda çêdibin. Divê gel daxwazên xwe zelal bike. Eger hikumet bê rûxandin tu amadekirin an berdêl tune ye, gel di vê yekê de xemsar e bi taybet li navendê Îranê. Muxalefteke pir xurt tune ye ku welat bigre dest an jî derbeyeke biçûk çêkin. Gelê Kurdistanê bi tevahî amade ye. Nêzîkî 7 an 8 salan e ku ew xwe ji hêla exlaqî û siyasî ve rêxistin dikin. Mixabin, partiyên me yên siyasî yên li derveyî Kurdistanê ne amade ne. Heft partiyên Kurdî li rojhilatê Kurdistanê civiyane, lê gel dê li benda wan nemîne heya ku ew xwe rêxistin nekin û yekîtiyek siyasî û leşkerî ava nekin. Yekîtiyek xurt pêwîst e, çi neçarî be an dilxwaî be."

**'Îran piştî şerê bi Îsraîl re şikestinekê dijî'**

Sîvan Seîd bal kişand li ser Hizbullah û Hamas ku çawa li derveyî Îranê li dijî welatên ku dixwestin bandora xwe ya Şîe berfireh bikin şer dikirin û wiha got: "Bi vî awayî Îran derbên mezin nedixwar. Lêbelê piştî şerê Îran û Îsraîl, niha ew şikestinekê dikişîne, êdî hêza wê ya derveyî nema ye. Cîhana Sunnî ji vî şerî bi qasî Îsraîl, nemaze Erebistana Siûdî û Îmaratên Erebî yên Yekbûyî kêfxweş e, lê naxwazin ku ev şer bibe sedem ku dewlet tam bikeve, yanî hevsengiya hêzan ji bo Suuniyan pir giringe. Ji ber



ku ji Îran re mezintirîn dijmin ne Îsraîl û Emerîka ye lê Siûdiye ye û berovajî ji bo Îran, ev tê wateya pirsgirêka Suune û Şîa mezintire li dewletên ku lê hene."

Pirofîsor Sîvan Seîd axaftina xwe wiha qedand: "Li deverên ku rêxistinên Kurd li Rojhilatê Kurdistanê bihêz in, gel xwe birêxistin kiriye, rewşa siyasî tam fêmkirine û dibe ku dem ji bo Îranê guncaw be ku li wir jî rêveberiya rizgariyê bike, mîna li Rojavayê Kurdistanê, ku Hêzên Sûriya Demokratîk bûne hêzek parastinê ya sereke ji bo tevahiya Sûriyeyê, wê heman Sînaryo li Rojhilat wê bê dîtin, ger aliyên berpirsiyar xwe bicîh bînin, gel amade ye. Wekî din, li deverên din ên Îranê, rêxistinên Kurd dixwazin xebata xwe pêş bixin û Rojhilatê Kurdistanê dê di azadkirina deverên din ên Îranê de pêşeng be."

# 'Çavê li deriyan, xwelî li seriyan'

**Volqan Elî**

Bi rastî ez bi vê serenavê nefikîbûm. Lê dîsa jî vê xwe li ser gotarê ferz kir. Hûn ê bêjin, "ma te ji bo vê gotarê çi serenivîs fikirîbû?" hema wisa ne lezînin... Min digot, bila vê carê serenivîsa me ev be: 'Ji bo PDK'a Mala Barzanî kar û şuxulek pêwîst e, kî li derdora xwe 'şuxulekî qenc' peyda bike bila ji kerema xwe agahî bide vê Malê'. Lê dengê ji nava dîrokê dihat alîkariya min kir. Min dît, pêwîstî bi ev çend hevokek dirêj tine. Va ev gotina pêşiyên me yên nûranî, ez ji derd û xemekê, wisa xelas kirim. Xwendekarên nebihîstibin yan jî pê nezanibin ku ev Mala naskirî (Mala Barzanî) çi karî dike, divê mirov bêje ku ew jî li gorî wê li 'şuxulekî qenc' bigerin. Dema ez dibêjim 'şuxulekî qenc', li gorî vê Mala Mezin 'qencî' çi be ew... Xwendekarên dil bi rehm wê bêjin "me fêm nekir, hineke din jî veke. Çi kar û şuxulî dike, ev Malbata reben? Em bizanin..." Hema ez bi kurt û kurmancî ji we re bêjim; karê Qebîl dike û timî li pey birayê xwe Habîl e. Timî çavên wan li ber deriyan e...

Ka kîjan cîranê wî yê xêrnexwaz çav berdaye mal û milkê welat ku hema dest bike qirika birayên xwe û li ser mîrasê pêşiyan lotikan biavêje! Na, em zêde nabêjin! Em li tu kesî neheqî jî nakin û dîrokê û pêşiyên me ev heq, ne daye me û ne daye ti kesê din.

Sal 1946'an payiza dereng a vê salê ye. wext û zeman piştî şerê cîhanê yê duyemîn e. Dewr û dewran qulupiye, hêzên wekî Rûsyaya Sovyet û DYE û Brîtanya li hev kirine. Ji ber vê yekê, Komara Mihabadê ku pişta xwe dabû Sovyetê, bi ber bayê felekê ketibû. Eşîr û fermandarên gewre yek bi yek terka Komara Qazî Mihemed ku bi destê xwe ava kiribû, didan. Hê artêşa Îranê negihîştibû Mihabadê, Mele Mistafa Barzaniyê min û te bêhna xwe li cem Stalîn berda. Piştî çend mehan, Qaziyê Pêşawa, ji ber xiyaneta birayan, li meydana Çarçira ku Komar îlan kiribû hate darvekirin.

Hûn ê bêjin, "ma Rûsya çi da Mala Barzanî". Di belgeyên dîrokê de tomar kiriye: Mala Barzanî li wir 12 sal dimîne. Tevî eşîr û çekdarên li dora wan. Di deh salên pêşde çi dike? Hemû di arşîvên dîrokê de tomar kirî ne. Bi hezaran serê şoreşgerên Rojhilat û Başûrê Kurdistanê di dîrokên cuda de bi çend quruşan firotine Şahên Îranê, firotine Iraqê. Hesabê Silêman Muînî, Dr. Şivan, Seîd Elçi di nava rûpelên dîrokê de maye. Sûnd û peyman bi DYE're, çêkirine û li dijî Abdulkerîm Qasim, heta Sadamê ku em jê re dibêjin faşîst e, şer dane destpêkirin. Di pêşberê çi de? Ji DYE'ê û îranê soz girtine ku ew ê otonomî bidin wan (mala Barzanî). Lê mixabin... Ya herî dawî, ya herî giran bûye. Tevgera Azadiyê li dijî dijminê gelê Kurd şerê çekdarî di 1984'an de, daye destpêkirin. Têkoşîna çekdarî 41 salan berdewam kiriye, vê Malbatê timî li cem dijminê gelê Kurd cihê xwe girtiye. Ji ber vê yekê, li cem dijmin qîmet û rûmeta wan her zêde bûye. Her ku agahiya wargehek gerîlayên azadiyê daye dijmin û dijmin, ev Malbat bi xalîçeyên sor pêşwazî kiriye û rêya bazirganiyê jê re vekiriye. Ketiye rêzên destpêkê yên dewlemendên cîhanê. Li aliyê din bi sedan keç û xortên gelê Kurd jî, bêyî ku gilî û gazincan bikin ketine hemêza axa sar.

Hûn ê bêjin, "encam"?

Rêber Apo bi bangawaziya kiribû, dawî li têkoşîna çekdarî aniye. Eger ev pêvajo bi serkeftî encam bibe, wê gelek derdor bê şûxul û kar bimînin. Yek ji van jî Mala Barzanî ye. Çima? Wê êdî nikaribe agahiya gerîla bide dijmin, nikaribe li dijî wan cur bi cur şer bimeşîne. Wê demê dijmin çima xalîçeya xwe ya sor qirêj bike, çima jê petrol bistîne û çima li ser hesabê Malê pere bixe banqayan? Eger yek, çavê xwe berde destê xelkê ku pê debara xwe bike, ew ê carekê xwe bimeşîne, du caran xwe bimeşîne, lê cara sêyemîn vala vegere. Va em li dîrokê meyze dikin ji me re wisa dibêje; Vê malê Komara Mihabad erzan firot, xwe meşand. Xwîna şoreşgerên Başûr û Rojhilat bi destê xwe rijand, xwe meşand. Çendîn gerîlayên azadiyê, bi balafirên bê mirov ê dijmin, şehîd bûn bi saya vê Malbatê, lê dîsa jî ew bê şûxul û bê îş man.

Çi gotiye pêşiyên me: Çavê li deriyan, xwelî li seriyan!



**Peyama bi dîmen û deng a Rêber APO!**

**Ahmet Aktaş**

Piştî 26 sal û 4 meh û 24 rojan- ji 15'ê Sibata 1999'an heta 9ê Tîrmeha 2025'an- em, teze peyama Rêber APO ya bi dîmen û deng dibînin û dibihîzin.

Mirov dikare pêşewaziya vê peyama dîrokî, ji du aliyan ve şîrove bike; aliyê civakî-hestiyarî û aliyê siyasî.

Di serî de ji aliyê hevalên wî, gelê Kurdistanê û dostên Kurdistaniyan ve, pir bi hestiyarî, derûnî, kêfxweşî û serbilindî hat pêşewazî kirin.

Herwiha, li her deverê ku kurdistanî lê hebûn, lê bi taybetî li Rojava, weke pîrozkirina cejnekê bi şahî, kêfxweşî û evîndarî hat pêşewazî kirin.

Ev tê wateya ku vî Rêberî ewqas mezin, kûr û dûr, di mejî û dilê gelê xwe de, xwe daye bicîhkirin.

Lewma ne 26 salan, bi sed salan û bi hezaran derew û bêbextiyan jî, ev Rêberî, nikare ji dil û mejiyê gelê Kurdistanê were derxistin.

Her wiha ne bi tinê gelê Kurdistanê, belê ji aliyê hemû gelên mezlûm ên herêmê û cîhanê ve û ji aliyê dostên gelê Kurdistanê ve jî, bi dilgermî û xweşî hat pêşewazî kirin.

Vê carê jiber ku bi dimen û deng bû, li ser çapemeniya Kurdistanî û cîhanî jî, bandorek erênî ya hêja kir.

Ev pêşewaziya bi rûmet a piralî ya ji aliyê raya giştî ve, ya ji peyamên Rêber APO re, dide nîşandan ku ne bi tinê gelên Kurdistanî, belê di mejî û dilê gelên mezlûm û dostên kurdan de jî, cihekî zêrîn çêkiriye.

Em, vegerin bala xwe bidin aliyên siyasî yên vê peyama Rêber APO, em dibînin ku him rê li ber me rohnî dike/rê vedike û bi giştî barê me sivik dike û li himber neyaran destê me xurt dike.

Bi vî awayî, heta astekê rê digire li ber êrîşên nerînî yên siyasî, propagandî û bi giştî xerabiyên neyaran jî, bi gotinek din çek û amûrên wan ên xerabkar ji dest wan distîne.

Lê belê ji aliyekî ve jî, me xemsar nahêle, barekî bi rûmet ê ji bo avakirina serdema nuh dide ser milê me.

Jixwe çarçova stratejîk û tektikên vê qonax û serdema nuh jî pêşkêşî me dike û ji me dixwaze ku em xwe tembel û xemsar nekin, li goreyî şerd û mercên nuh ên ji me re destnîşan dike, em bi kesayetiyek nûjenkirî, bi dil û evîndarî, bi xemxurî û serbilîndî, dest bi tevgêrkirin û xebata sazûmankar a vê qonax û serdema nuh bikin, da ku destê Rêber APO jî xurtir bibe.

Kurt kurmancî, weke Rêbar APO jî destnîşan dike, heke em bi ruh û zihniyetek nûjenbûyî ya komunalist xwe ji hundur û ji der ve karibin xwe bi xemilînin, êdî tu kelem û astengên ku karibin xwe li ber rêya me ya pêşkeftinê ragirin namînin.

Qonaxa em dikevînê, bi zelalî daye ber çavên me ku; me di qonaxa çekdarî de hebûna xwe da pejirandin, êdî em derbasî qonaxa destxistina azadiyê dibin, formulasyona wê jî; avakirina Aştî û Civaka Demokratîk e, ew jî bi xebatên rêbaz û şêwazên li ser çarçova Siyasî û Huqûqî pêktên.



# Dagirkeriyê cihên bihûşt veguherand dojeheke li ser rûyê erdê

**Bi avabûna Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê re êrişên dagirkeriya Tirk û çeteyên wê li ser herêmê zêde bûn û gelek cih hatin dagirkirin. Cihên dagirkirî jî veguherîn mîna dojehekê.**

**Navenda Nûçeyan/Qamişlo**

Li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê, heta li Rojhilata Navîn cara yekem pergaleke ku vîna hemû pêkhateyan diparezê, dikeve meriyetê. Ev pergala ku di herêmê de bi hişmendiya neteweya demokratîk bi pêş dikeve, gava xwe ya yekem li herêma Cizîrê ya bi ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê ve avêt, piştre wek pergaleke esasî di hemû herêmê de xwe bi rêxistin kir. Pergala Rêveberiya Xweser a ku bi hişmendiya neteweya demokratîk bi pêş dikeve, ji gava xwe ya destpêkê de rastî gefên dagirkeriya Tirk hat. Nexasim dewleta Tirk li hemberî vê sîstemê bertekên hişk nîşan dan û her tim gef lê xwarin. Heta tenê bi bertek û gefan jî sînordar nema, ambargoyên aborî, siyasî û li hindek deveran jî bi êrişên leşkerî xwest pergala Rêveberiya Xweser têk bibe. Ji bo vê bi awayekî eşkere piştevaniya çeteyên DAIŞ'ê jî kir. Lê dîsa jî ev pergala ku hêza xwe ji gelê herêmê digire, tevî astengiyan jî bi serkeftina têkbirina DAIŞ'ê re ji qonaxa avakirinê derbasî merheleyeke nû bû.

**Avabûna Rêveberiya Xweser li Bakur û Rojhilatê Sûriyê**

Sala 2011'an piştî ku şoreşa gelan dest pê kir, gelê herêmê bi rengê saziyên civaka sivîl û bi birêxistinkirina saziyan xwe bi rê ve bir. Ji bo birêvebirina vê herêmê û peydakirina derfetên jiyanê pêwîstiya pergaleke rêxistinî hebû. Li gorî vê pêwîstiyê di 21'ê Çileya 2014'an de Rêveberiya Xweser ya herêma Cizîrê hat ragihandin. Di 27'ê Çileya 2014'an de li herêma Firatê û 29'ê Çileya 2014'an jî li herêma Efrînê Rêveberiya Xweser hate ragihandin.

**Erişên dagirkeriya Tirk bi avakirina Rêveberiya Xweser re hate destpêkirin**

Ji destpêka avakirina Rêveberiya Xweser heya niha gef û êrişên taybet ên dewleta Tirk kêm neman. Çeteyên DAIŞ'e ji ku derbasî herêmê bibin û li dijî Rêveberiya Xweser şer bikin, dewleta Tirk hem rê hem jî alîkariya lojîstîkî da wan. Dewleta Tirk ji bo ku zextên xwe yên li ser herêmê zêdetir bike deriyê sînor jî girt û bi vê şewazê li hember herêmê ambargoyek aborî pêk anî. Êrîşên siyasî jî bi awayê ambargoya siyasî pêk hatin, rê li pêşiya gelek tevger û aliyên siyasî girtin û nehiştin derbasî herêmê bibin.

**Heger şerê çekdarî demekê hatibe rawestandin, şerê taybet qet ranewestiyaye**

Ji destpêka birêxistinkirina saziyan heya avakirinê, Rêveberiya Xweser her tim rastî êrişan dihat û hê ev êriş bi awayên cûda dewam dikin. Bi taybet dewleta Tirk a dagirker dema dît ku Rêveberiyeke Xweser li kêleka sînorên wê ava dibe. Heya niha jî li ser vê sîstema xweser êriş û gefên xwe berdewam dike. Heger demeke şerê çekdarî û balfirên şer jî li ser



Rojava hatibe rawestandin, lê hewldana şerê taybet qet nehatiye rawestandin.

**Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji pirengiya pêhateyan pêk tê**

Bakur û Rojhilatê Sûriyê cografyayek zêdetirî 600 km bi rê ve dibe. Di herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê de zêdetirî 5 milyon kes ji hemû pêkhateyên Kurd, Ereb, Suryan, Ermen, êzidî, Çeçen, Çerkez, Tirkmen dijîn. Zêdetirî milyonek koçber jî di herêmê de di nav sîstema neteweya demokratîk de cihê xwe digirin.

**Li dijî kurd û Kurdistanê 'Plana Têkbirinê'**

Desthilatdariya faşîst a AKP-MHP'ê û saziya şer a bi navê Desteya Ewlekariyê ya Milî (MGK) di 30'ê Cotmeha 2014'an li Enqereyê li hev kom bû û li dijî kurd û Kurdistanê bi navê 'Plana Têkbirinê' konsepteke nû ya komkujî û kaosê xiste meriyetê ku ji ya salên 1990'an gelekî girantir bû. Heger em bal bidnê ku avabûna Rêveberiya Xweser jî di heman salê de ye, ev yek bi eşkere xwe dide diyarkirin ku çawa dewleta Tirk ji xweseriya gelê Kurd hisab dike.

**Piştî têkbirina DAIŞ'ê dewleta Tirk bixwe kete dewreyê**

Hikumeta Enqereyê di dema êrişa DAIŞ'ê ya li ser Kobanê de polîtîkayeke dualî dimeşand, li aliyekî bi rayedarên Şoreşa Rojava re hevdîtin dikir, li aliyê din jî ji bo qetilkirina kurdan lojîstîk û cebilxane dida çeteyên DAIŞ'ê û rê dida çeteyan ku di sînorê wê de derbasî Rojava bibin. Piştî ku kurdan bi rengekî dîrokî DAIŞ têk bir, êdî dewleta Tirk bixwe kete dewreyê.

**Êrişa yekem a dewleta Tirk li ser Çiyayê Qereçoxê**

Piştî ku hêzên parastinê yên Rojava li dijî DAIŞ'ê bi rengekî serketî bi pêş ve çûn, dewleta Tirk ji vê yekê aciz bû û di dema operasyona rizgarkirina Tebqayê de, di berbanga 25'ê Nîsana 2017'an de êriş bir ser Çiyayê Qereçoxê yê herêma Dêrikê ku 3 parçeyên Kurdistanê digihîne hev. Êriş bi 26 balafirên şer li dijî navenda çapemeniyê û biryargeha Yekîneyên Parastina Gel (YPG) hate kirin. Di encamê de 20 şervanên YPG'ê û kedkarên çapemeniyê şehîd bûn, 18 jî birîndar bûn. Êdî bi vê êrişên deriyên gelek êrişan vebû, ya din jî ku dewleta Tirk ber bi rêya dagirkirinê ve çû.

**Êrişên dagirkeriyê yên eşkere bi Efrînê re dest pê bû**

Hikumeta Enqereyê li dijî hewldanên kurdan ên ji bo statuyê, dest bi pêleke nû ya dagirkirinê kir. Di demekê de ku hêzên YPG û YPJ'ê li Dêrazorê li dijî DAIŞ'ê operasyon dikirin, dest bi gefa dagirkirina Efrînê kir û 20'ê Çileya 2018'an de bi navê 'Tevgera Şaxê Zeytûnê' dest bi êrişa dagirkirinê kir. Bi 72 balafirên şer bi şev û roj bombe li Efrînê barand û van êrişan 58 rojan dewam kir.

**Pêvajoya êrişên berfireh bi bahaneya 'ewlekariya sînor'**

Piştî ku çeteyên DAIŞ'ê di Baxoz de hate têkbirin, vê carê pêvajoyeke nû ya êrişên berfireh dest pê kir. Hikumeta Enqereyê bi bahaneya 'ewlekariya sînor' di 9'ê Cotmeha 2019'an de li dijî Serêkaniyê û Girê Spî bi navê 'Kaniya Aştiyê' dest bi şerekî nû kir.

**Guhertin demografîk li herêmên dagirkirî**

Desthilatdariya AKP-MHP'ê ji bo xaka Rojava ya dagir kiriye bixe nava sînorên Mîsakî Mîllî, destpêkê mirovên li wan herêman qetil kir an jî ji cih û warên wan, koçber kirin. Li herêmên ku nêzî milyonekê kes jê koçber kirin, çeteyên ji Tirkmenistan, Kirgizistanê û ji herêmên cûda ve tevî malbatên wan bi cih kirin. Navê kolan, tax û gundan guhert, saziyên Tirk lê vekir, zimanê perwedeyê kir tirkî, lîreyê tirk kir bazaran de.

Dewleta Tirk a dagirker, li gel bêdengiya navdewletî, demografiya herêmên Sûriyê yên ku dagir kirine diguherîne. Şêniyên resen derdixe û malbatên çeteyan lê bicih dike. Ruxmî ku di gelek rapor û sejmariyên saziyên hiqûqî yên cîhanê de siyaset û armancên Tirkiyê û rastiya sûcên wê eşkere dikin. Li Cerablus, Ezaz û Babê bi hezaran sivîl hatin koçberkirin, bi taybet pêkhateyên Kurd ku siyasetên Tirkiyê qebûl nake. Herwiha çeteyên Tirkiyê li Minbic, Tilrifet, Serêkaniyê, Girê Spî û Efrînê sûcên şer ji kuştin, revandin, wêrankirina herêmê pêk tîne û sivîlan bi zora çek û îşkenceyê dan koçberkirin.

**Rewşa bajarên Girê Spî û Serêkaniyê ji Efrînê ne cûda ye**

Bajarên Girê Spî û Serêkaniyê para xwe ji sûcên Tirkiyê girtin. Dewleta Tirk a dagirker di 9'ê Cotmeha 2019'an de her du bajar dagir kir û zêdetirî 250 hezar şêniyên resen da koçberkirin. Rewşa her du bajaran ji Efrînê ne cûda ye. Dagirkeriya Tirk û çeteyên wê sûcên şer li dijî jinan li herêmên dagirkirî; Cerablus, Ezaz, Bab, Efrîn, Girê Spî û Serêkaniyê pêk tîne. Jin li van herêman rastî her cûreyên cûda yên tundiyê hatine ji kuştin, revandin, êrişên cinsî û tundiya bedenî. Sekretera giştî ya Partiya Pêşerojê ya Sûriyê Hevrîn Xelef jî yek ji qurbaniyên sûcên çeteyên Tirkiyê ye.

**Ambargo pêk anî û herêmên sînor dorpêç kir**

Li dijî Bakur û Rojhilatê Sûriyê ku nêzî 5 milyon mirov lê dimînin, êrişeke din jî bi ambargo û polîtîkayên dorpêçkirinê da destpêkirin. Deriyê Sînorê Til Koçerê ku deriyê herî mezin ê navbera Rojava û Iraqê ye û alîkariya mirovî ya ji bo herêmê ji vê derê tê, di destpêka sala 2020'an de di civîna Konseya Ewlekariyê ya Neteweyên Yekbûyî de piştî vetoya Rûsya û Çînê hate girtin. Rewşa deriyên sînor ên li aliyê din jî bi heman rengî ye. Bi polîtîkaya ambargo û dorpêçkirinê ku pêlek ji 'Plana Têkbirinê' ya desthilatdariya AKP-MHP'ê ye, hewl tê dayin ku Şoreşa Rojava bê fetisandin.

Guhertina demografiya herêmên dagirkirî û pêkanîna sûcên şer çavê dewleta dagirker têr nekir, heman demê de ciwanên Sûrî di şerên xwe de bikar anî, da ku projeya xwe ya Osmanî pêk bîne. Ji ber sûcên Tirkiyê nerazîbûn her li herêmên dagirkirî de derdikevin. Ji ber li van herêman mal û milkên koçberan hatin wêrankirin, tiştên ku wan bi axa wan ve jî girê dide, ji holê tê rakirin, da ku dagirkerî bide diyarkirin ew ne axa Kurda ye ew axa wê ye. Lê her çiqas bêdengî hebe, rastî bi kiryaran nayê veşartin, ji ber xwediyên ku rastiyê bêjin hene. Lê êşa mezin ew e ku ev herêm mîna buhiştê bûn, niha jî dagirkeran ew veguherandin dojeheke li ser rûyê erdê.

Gelo heya dagirkerî hebe wê çiqas kiryar bên kirin û qurbanî bên dayîn?

Rewşa herêmên dagirkirî heya roja îro bi heman rewşê tê domandin ku kiryarên dijmirovî bi her awayên xwe pêk tê. Lê hêviyeke mezin a gelê Kurd bi taybet koçberan, bi banga Rêber Apo ya ku di 27'ê Sibatê de hat kirin, çê bû. Ji ber ev bang xwedî bandorekî Kurdistanî ye li ser esasê banaga "Aştî û Civaka Demokratîk" ku ev yek pêvajoyekî aştiyê ji bo çarenûsa gelê Kurd û Tirk bi taybet hate kirin. Ji bo wê heger ev bang ji aliyê dewleta Tirk ve têkeve nava meriyetê de, divê dewleta Tirk xwe ji herêmên dagirkirî derxîne. Lê heya ev yek pêk bê gelo wê çiqas kiryar bên kirin û qurbanî bên dayîn.

FENER



**Rêber APO Rûyê Geşedanên Li Herêmê Diguherîne**

**Idrîs Henan**

Piştî 26 salan Rêber Abdulah Ocalan rojeva dunyayê diguhere û hemû hêzan tûşî wê yekê dike ku li siyastên xwe vegerin û ti hesabên vala li ser pişta înkara Kurdan û gelê herêmê yên esîl nekin.

Rêber Abdulah Ocalan di nameya xwe ya vîdyoyî de tekezî li paradîgmaya manîfestoya Aştî û Civaka Demokratîk ku weke "serketina manîfestoya Riya Şoreşa Kurdistanê ya 50 salî ye" kir.

Her wiha Rêber Abdulah Ocalan li vê wezîfeya xwe weke erkek exlaqî yê dîrokî mêze dike ku divê bi hişmendiya civaka demokratîk hêz bide pêvajoyê. Lew re jî got "ez hê jî vê bangê diparêzim".

Rêber Ocalan bi awayekî jixwebawer û bi karaterê lîderekî 26 salên îşkenceyê vala derxistiye, piştrast dike ku manîfestoya civaka demokratîk wê riyên serkeftinên dîrokî veke. Her wiha Rêber Ocalan tesîra pêşketin û geşedanên çendîn sal in li herêmê û cîhanê rû didin li gavên xwe yên pratîk bi bîr tîne ku qonaxa heyî gavên pratîk ên dîrokî neçar dike û vê veguhertinê weke gaveke bivênevê ya ku hebûnê diparêze û serkeftina qonaxekê radigîhîne dibîne.

Rêber Ocalan rave dike; "Hebûn hate naskirin, lewma armanca sereke jî pêk hatiye. Ji ber vê mîada xwe temam kir".

Rêber Ocalan ji bona ku rewşa xetimîn û dubarekirinê ya têkoşîna azadiya Kurd derbas bike, siyaseta demokratîk a bi sernavê Aşîtî û Civaka Demokratîk weke stratejiya qonaxa bê destnîşan dike ku mercekî man û nemanê ye. Lew re jî girîngiya wê stratejiyê ya dîrokî wiha vedibêje: "Di wateya dîrokî de em behsa pêvajoya diyarkirina qederê dikin".

Ji bona pratîzekirin û serxistina vê paradîgmayê, bicihanîna berpirsiyariyan şertekî bingehîn e. Ango divê hemû alî bi nêzîkatiyên berpirs vê qonaxê hembêz bikin û çi dikeve ser milê kê pêk bîne.

Çawa ku PKK erka xwe ya dîrokî anî vê roja îro û entegeyî qonaxa nû ya Aştî û Civaka Demokratîk bû, divê dewleta Tirk jî gavên ku dilsoziya niyetên wê eşkere dikin biavêje û derhal aliyên zagonî û hiqûqî ve çi bikeve ser wê pêk bîne.

Rêber Ocalan di peyama xwe ya vîdyoyî de, dîsa ji dunyayê re radigihîne ku ew xwedî baweriya aşîtiyê li dijî şer û çekan e. Lew re kelecana xwe venaşêre û geşbîniya xwe bi pêşerojeke azad ku hemû netewan di hembêza siyaseta demokratîk a paradîgmaya Aştî û Civaka Demokratîk de bihewîne, raber dike.

Diyare vê perspektîfa Rêber APO ji siyaseta herêmî û ya navdewletî re hinek hesabên hêzan tevlihev kiriye ku helwest û nêzîkatiyên cuda derketine pêş.

Li Sûriyê; hemdemî roja peyama Rêber Ocalan, şandeya siyasî û leşkerî ya Bakur û Rojhilatî Sûriyê digihe Şamê. Li wir jî wezaret û aliyên fermî yên qaşo bi ser hikûmeta veguhêz a HTŞ ve ne, dixwazin bi talîmata Mîta tirk îtîfaqa 10 Adara îsal a di navbera Alşar`i û Fermandarê Giştî yê QSD Mazlûm Ebdî ve vala derxînin û bi awayê reşkirin û êrişan ji pabendiyên xwe birevin. Ev yek bi piştgiriya moral a nûnerê DYE Tom Barrak pêk hat. HTŞ carek din isbat dike ku li peyî siyaseta faşîzane ya nijadperest û olperest e ku dixwze rejîma Baas bi awayekî hê kirêtir bivejîne. Tu derdê wê ya pêkve jiyanê nîne û ne jî heyranê gelên Sûriyê ye ku rewatiyê bidin otorîteya wê. Bi piştgiriya navneteweyî ya ku li peyî kedîkirina wê û bikaranîna wê ye, hewl dide destpotiya xwe ferz bike û çavan li ber çarenûsa Baasê digire ku xwe di ser re dibîne.

Xuyaye şiklê têkoşîna gelê Kurd û hevalên wî bi kêrî destpotan nayê ku aştî li wan nayê. Divê her tim şer, pevçûn û xwîn be ku hebûna xwe dewam bikin. Ji ber vê jî, êriş û helwesta li Tirkiyê çi be wê li Sûriyê jî ew be.